hejmar 38 bihar 2006

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravayê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna bihara 2006an

Careke din delîveya kombûna civîna Kurmancî *li Dihokê, başûrê Kurdistanê, bi dest ket. Civîna me rojên di navbera 30/5 - 7/5 2006an de li dar ket.*

Di vê civînê de ev heval beşdar bûn:

Mustafa Aydogan (Mêrdîn), Rûken Bagdu-Keskîn (Stenbol), Lutfî Baksî (Xerzan), Ehmedê Dirihî (Çewlîg), Elîşêr (Wan), Samî Ergoşî (Barzan), Cewher F. Seîd (Hewlêr), Ebdulsetar Fettah (Dihok), Newzad Hirorî (Dihok), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Mahmûd Lewendî (Qerejdax), Enwer Mehemed Tahir (Hewlêr), Emîn Narozî (Batman), Kendal Nezan (Diyarbekir), Selam Nûman (Qamşilo), Fadil Omer (Dihok), Cemal Onursal (Cizîr), Enwer Osman (Hewlêr), Edîb Polat (Amed), Zinar Soran (Dêrik), Behrûz Şucaî (Kotol), Têmûrê Xelîl (Rewan), Reşo Zîlan (Agrî).

Ev cara didwan bû, ku me civîna xwe li parçe welatê xwe yê azad pêk anî. Bi dirêjahîya hefteyekê temam me li ser programeke giran kar kir. Xala herî girîng ya xebatê babeta navên gulûgîyayan yên hem zanistî û hem jî kurdî bû. Di vî warî de, bi sayeya kedeke yekcar mezin ya hevalên pispor ji başûr û bakurê Kurdistanê, me dikaribû em berhemeke berbiçav ji civînê derbixin.

Xalên din yên civînê, ji navên demûdezgehên dewletê û peyvên rojnamevanîyê pêk dihat. Piştî hîmdanîna dewleta federal li başûrê welat, çawan ku wê guhartineke nû di dîroka me kurdan de pêşde anî, wisan jî wê tesîra xwe li ser zimanê me kir. Hindek mefhûmên nû anîn û hindek delîveyên din dane ber pêşdeçûna zimanê kurdî.

Navên dezgehên dewletê û peyvên rojnamevanîyê du babetên girîng bûn ku divîya kar li ser bête kirin. Ev yek ji bo nêzîkkirina devoka kurmancîya bakur û behdînî jî xwedî girîngîyeke mezin bû.

Cihê serfirazîyê bû, ku ev civîna me rastî rojên yekbûn û hevgirtina herdu îdareyên Kurdistanê hatibû. Vê hikûmeta yekbûyî hêvî, hez û şewqeke bêhevta dixist dilê me hemûyan.

Bi dirêjahîya herdu hefteyên me li Kurdistanê, em bûn mêvanê hikûmetê. Vê hikûmeta yekbûyî em bi comerdîyeke kurdewarî hêwirandin û bi hêzên xwe yên ewlehîyê em hildan bin baskên xwe yên parastinê. Ji hîç xizmetekê dirixî nekir.

Em bi dilekî germ wê pîroz dikin û jê re xweşbextî û serkeftinê dixwazin. Herweha ji dil û can spasî vê mêvandarî û xizmetên pêşkêşkirî dikin.

Encamên xebata vê civînê di vê hejmara Kurmancî de tên belav kirin.

Flora Kurdistanê

Amadekar : Edîb POLAT

kurde	latînî	tirkî	fransizî	îngilîzî
adarok, gulalesûre, kurikmast	*Anemone coranaria*	taçlı kırlalesi, rüzgar çiçeği, gül lale	anémone couronnée, anémone de Caen	crown anemone
alal, hilale, mêlaq, lale, helal	*Tulipa*	lale	tulipe	tulip
baqilê gamêşan, şolgenîk, kuşne, baqilfisek	*Vicia sativa*	arpa fiği, buğday fiği, ekin fiği, (burçağın bir türü)	vesce commune	common vetch
baqilê xatûnî, kelîkê xatûnî, baqilxatûn	*Sativum saccharatum*	baklagillerden nazlı gelin	pois mangetout	sugar snap peas
baxox, angelok, kanêje	*Centaurea kurdica*	peygamber çiçeği	centaurée kurde	kurdish centaurea
behîva bejî, badema çiya, çaqale	*Prunus carduchorum*	yabani badem	variété d'amandier sauvage	species of wild almond-tree
bendika avî, vîzdorik (zaza)	*Cardamine hirsuta*	tüylü köpük otu	cardamine hérissée	hairy bittercress
bêwîjan, pûjang, gulikê maran	*Achillea millefolium*	adi civanperçemi	millefeuille, achillée	yarrow
beybûn, beybûna demanan, babûnc	*Matricaria chamomilla*	papatya	camomille	camomile
beybûna beyaran	*Matricaria sp.*	çayır papatyası	camomille des champs	corn camomile
binevş, binefş, wenewşe (zaza), gularengag	*Viola odorata*	kokulu menekşe	violette	violet
binevşa belek	*Viola tricolor*	alaca menekşe	pensée sauvage	wild pansy
birinc, riz	*Oryza sativa*	pirinç	riz décortiqué	rice
biyok, bih, bihok, bihî, bî	*Cydonia oblonga*	ayva	coing	quince
botav, batovk, nûjdar, bahtof, sûrinc	*Hypericum triquetrifolium*	kızılcık otu, kantaran	millepertuis	curled -leaf St John's wort
bûkik, bûkanî, bûk, bwîk, nîsanok, patpatok, patpatole, bûkûzava, gulenîsan, rêywek	*Papaver rhoea*	gelincik	coquelicot	common poppy
çarçar, şebraq	*Xanthium spinosum*	dikenli sıraca otu	lampourde épineuse	spiny cocklebur
çekem, dakone (zaza)	*Viscum album*	ökse otu	gui	mistletoe
çengê meryemê, sîklamen	*Cyclamen purpurescens*	siklamen, tavşan kulağı	cyclamen commun, cyclamen rouge-pourpre, marron de cochon	cyclamen
çevk, çexşûr (cûreyek heliz e)	*Ferula communis*	çakşır otu	férule commune	giant fennel
çîlek, tûya erdan, tûfrengî	*Fragaria vesca*	çilek	fraise	strawberry
çîm, giyareş	*Lolium temulentum*	delice	ivraie enivrante, herbe à couteaux	darnel ryegrass
colbenî, şolikê maran, baqilê maran, kelîmar	*Lathyrus tuberosus*	koşkoz	gesse tubéreuse, gland de terre	tuberous pea, sweet pea
çûng, pêmirîşk	*Ranunculus*	düğün çiçeği	renoncule	crowfoot
cux, bencerek (zaza)	*Digitaria*	çatal otu (dijitarya)	digitaire	common crabgrass, large crabgrass
darçîn	*Cinnanomum zeylanicum*	tarçın	cannelier de Ceylan, arbre à cannelle	cinnamon tree
dargerînk, daralînk, badar	*Hedera helix*	duvar sarmaşığı	lierre	ivy
darucan, şêrpûg	*Echinochloa crusgalli*	darıca otu	panic des marais, pied-de-coq	barnyard grass
dinêv, dimor	*Lolium temulentum*	delice	ivraie enivrante, herbe à couteaux	darnel ryegrass, tare
dirî, dirîmok, dirîreşk, dendûreşk, tûtirk	*Rubus*	böğürtlen	mûre sauvage	blackberry
dûvikê hespê, sipingê maran, singê maran, şitlê xezalan, tilîper, rûnîn (zaza), vaşbitrî (zaza)	*Equisetum arvense*	at kuyruğu	prêle des champs, queue-de-renard	horsetail, cattail, joint brass, bottle brush, shavegrass, horse pipe
dûvrovî	*Setaria faberii*	kirpi darı	sétaire géante, sétaire de faber	faber bristlegrass, giant foxtail, nodding foxtail

erpelan, pîrepind	*Scorzonera spp*	bir tür dağ çöveni	scorsonère	black salsifis
fasûlî, fasûlye, fasolî, fasla (zaza)	*Phaseolus vulgaris*	fasulye	haricot	bean
firêz (li hin deveran)	*Agropyron repens*	ayrık otu	chiendent	quackgrass
firêz, herêz, sînrek (zaza)	*Cynodon dactylon*	domuz ayrığı	chiendent, pied-de-poule, herbe des Bermudes	Bermuda grass
gêleqir	*Bellevalia*	dağ sümbülü	variété de jacinthe	species of hyacinth
gêlik	*Scilla kurdistanica*	yıldız sümbülü	variété de scille	species of scilla
genek, dargenek, pilxin (zaza)	*Datura stramonium*	şeytan elanası, boru çiçeği	datura, stramoine, pomme épineuse	datura, thorn apple, stramonium
genim	*Triticum*	buğday	blé	wheat, corn
genimê nan, genimê ardî (cureyên : genimê rûtik, genimê meksîkî)	*Triticum aestivum*	ekmeklik buğday	blé tendre, froment	wheat
genimê savar, genimê req (cureyên : genimê sorgul, genimê girover)	*Triticum durum*	sert buğday	blé dur	hard wheat, durum wheat
gêregiya, giyabawer, kokvaş	*Hordeum bulbosum (poaceae)*	duvar arpası, yabani arpa, yumrulu arpa	orge noueuse	bulbous barley
gezgezik, gezgezok, gezgezk, derzînk (zaza), geznik, gezgezing	*Urtica*	ısırgan otu	ortie	stinging nettle
gijok, rîxok	*Rhamnus kurdicus*	ak diken	nerprun, bourdaine	buckthorn
gilgilê stembolî, garîsê stembolî, genimşamî, lazût	*Zea mays*	mayıs	maïs	indian corn
giyabeng, xirebenk	*Hyoscyamus niger*	kara banotu, göztohumu	jusquiame noire, herbe aux poules	black henbane
giyagewrik, kifkedûpişk, giyadûpişk, vaşogewr (zaza)	*Heliotropium europaeum*	bamkul otu	héliotrope	heliotrope
giyagirêçk, sûrpencik, darê şivanan	*Polygonum*	çoban değneği	renouée	knotgrass
giyayê belalûkê	*Veronica spp*	yavşan otu	véronique	speedwell, veronica
guhbelok	*Phlomis grandiflora*	ayı kulağı	phlomis à grandes fleurs	phlomis grandiflora
guhmişk, gijnija rovî	*Anagallus avensis*	tarla fare kulağı	mouron rouge	scarlet pimpernel
gula bênijînê	*Arnica montana*	dağ arnikası	arnica des montagnes	mountain arnica
gula çavêşê, hemîşe bihar	*Calendula arvensis*	altmak, şamdan çiçeği, ayni sefa, portakal nergizi	souci des champs, gauchefer, souci sauvage	wild calengula, field marigold
gula hesretê, hanek (zaza)	*Crocus sativus*	safran	safran	saffron
gulengî, heşvil (zaza), savil (zaza), gulherçî	*Paeonia officinalis*	ayı gülü	pivoine	peony
gunikê beranan	*Polygonum convolvulus L.*	sarmaşık çoban değneği	renouée liseron	wild buckwheat, black bindweed
guriz, gelziwan (zaza), gurisk	*Anchusa officinalis*	tıbbi sığır dili	buglosse officinale	common bugloss
guriz, gelziwan, gûriz, gwîriz	*Myosotis arvensis*	unutma beni	myosotis des champs	field forget-me-not
gurk, gurgeh	*Orobanche*	canavarotu	orobanche	broomrape
gurnîkê mêşinan, gurnûka	*Arctium lappa*	dulavratotu	bardane, rhubarbe du diable	greater burdock
gurxenêq, kerxenêq	*Aconitum napellus*	kaplanboğan, kurtboğan	aconit napel, casque de Jupiter	monk’s hood
gûriz, golmize, zimanê ga	*Anchusa azurea kurdica*	sığır dili	buglosse	bugloss
hêjîr, încire	*Ficus carica*	incir	figue	fig
helerge, lerge	*Angelica archangelica*	melik otu, angelica	angélique	angelica
helhelok, belalûk	*Prunus mahaleb*	mahlep, idrisağacı	faux merisier	mahaleb sherry
helîkek, giloka zer, gelûka zerde, helikok	*Erysimum kurdicum*		vélar, érysimum	wallflower
hêro	*Alcea kurdica*	hatmi çiçeği	rose trémière sauvage	wild hollyhock
hes	*Ornithogalum kurdicum*	yabani sümbül	variété d’ornithogale	ornithogalum
hevrist, hêvrist, wêrs, wers, hors	*Juniperus communis*	ardıç	genévrier commun	juniper
hêzeran, tûra kûrila (Kerkûk)	*Delphinium*	yabani kuşayağı	delphinium, pied d’alouette	delphinium
hinar, henare	*Punica granatum*	nar	grenade	pomegranate
hingivîn, mijmijok, vaşê mêşan (zaza)	*Lamium spp*	ballıbaba	lamier	dead nettle
îsotê cumo	*Physalis alkekengi*	güvey feneri, patlangaç	physalis, alkékenge, coqueret	physalis, winter cherry, cape gooseberry
îsota sor, bîbera sor	*Capsicum annum*	kırmızı sivri biber	piment	pepper, capsicum, chilli
kakao, kekew	*Theobroma cacao*	kakao	cacao	cacao
karî, kardî, kardû, marmaroşk	*Arum maculatum*	lekeli yılan yastığı	arum tacheté, gouet tacheté, pied de veau	lords and ladies, cuckoo pint
kartol, petate, qûnpir, ritax, kirtop, sêvik, kartofil	*Solanum tuberasum*	patates	pomme de terre	potatoe
kelendor, kerbeşa derewîn, zirkerbeş, kerbeşa keran	*Onopordum spp.*	adi eşek dikeni	chardon	cotton thistle
kelxa deveyan, qoleg	*Centaurea kurdica*	devedikeni	variété de centaurée	centaury
kergezik, gezing	*Urtica dioica*	büyük ısırgan	grande ortie, ortie dioïque	large nettle
kerbalcana bejî	*Atriplex hastata*	kara pazı	arroche hastée	hastate orache, iron root
kerengnebî, kengirker, kêngerê nebî, çîstole	*Eryngium campestre*	boğa dikeni	panicaut champêtre	sea holly
kevlepîr	*Boraginaceae*	hodan	myosotis	forget-me-not
kêrat, qereqaç	*Anagyris foetida*	zivircik	anagyre fétide, bois-puant	bean clover, stinking wood
kitan, kitaf, guş	*Linum*	keten	lin	flax
kitana kûvî	*Linum usitatissimum*	yararlı keten	lin utile (utilisé pour l’huile)	annual flax, linseed
kizink, kiznok, xulêr, kizina bejî, xurêl	*Vicia cracca*	kuşfiği	vesce craquette,	bird vetch
rihan, merzekew	*Ocimum basilicum*	fesleğen	basilic	basil
kîsikê şivanî, tûrikê şivanan, tarek (zaza)	*Capsella bursa pastoris*	çoban çantası, kuşkuş otu	capselle, bourse-à-pasteur	shepherd’s purse
koksor, lûexandir (zaza)	*Amaranthus retroflexus*	kırmızı köklü tilki kuyruğu	amarante réfléchie, amarante à racine rouge	redroot amaranth, redroot pigweed
kulîlka cotarî, hanhanek, ciwanemerg, pîvok	*Merendera kurdica, Colchicum kurdica*	gül faki	colchique du Kurdistan	autumn crocus , meadow saffron
kuncîkerk	*Sesamum indicum*	yabani susam	sésame	sesame seed, sim sim
lavlavka avî	*convolvulus ssp*	kuzu sarmaşığı	fleurs violettes, grimpe aux arbres	
lavlavk, leflefok, malvênçe	*Convolvulus arvensis kurdica*	tarla sarmaşığı	liseron des champs	bindweed, lesser bindweed
lîmon, leymûn	*Citrus*	limon	citron	lemon
mamîran	*Gentiana lutea*	sarı jantian	gentiane jaune	yellow gentian
mastêrek, tiliya xanimê	*Digitalis purpurea*	yüksük otu (alrenkli)	digitale pourprée	foxglove
mastêrk, sinbêleşên (zaza)	*Polygonum persicaria*	kırmızı ayaklı kara buğden	renouée persicaire	persicaria
meroje, merje, mîrajo	*Asparagus officinalis*	kuşkonmaz	asperge	asparagus
nançivîk	*Thlapsi arvense*	tarla akça çiçeği	tabouret des champs, monnoyère, herbe-aux-écus	stinkweed, pennycress
nanê çûçê, nançivîk, nançûk, nançûçik	*Thlapsi kurdicum*	çoban dağarcığı	monnoyère, tabouret des champs	field penny-cress
naznaz	*Portulaca grandiflora*	ipek çiçeği	pourpier à grandes fleurs	moss rose
nefel	*Trifolium spp*	yonca	trèfle	clover

nefela nêr, nefela binêrik	*Trifolium hybridum*	melez yonca, isveç üçgülü	trèfle alsike, trèfle hybride	alsike clover
nefela sor, keta sor	*Trifolium pratense*	kızıl yonca, çayır üçgülü	trèfle rouge, trèfle des prés	red clover
okalîptus, tadar	*Eucalyptus globulus*	ökaliptus	eucalyptus	eucalyptus
pencepisîk	*Ranunculus repens*	horoz ibiği, sürünücü düğün çiçeği	pied de poule, renoncule rampante	creeping buttercup
peqpeqok, teqteqok, çeqçeqok	*Silene spp (caryophyllaceae)*	nakil, yapışkan otu	silènes	catchfly
pirpar, parpar, pêpîne	*Portulaca oleracea*	semiz otu	pourpier commun	purslane
pîvaz, piyaz	*Allium cepa*	soğan	oignon	onion
pîzel, pîzil	*Juncus*	hasır otu	jonc	rush
pûjan, naneya bejî	*Mentha arvensis*	kır nanesi	menthe des champs	mentha arvensis
qaçmûk, şewbor	*Hesperis kurdica*	acem menekşesi	variété de julienne	common dame's violet
qaco, şîrok, talîşk, xasa bejî, talika zerencam (zaza)	*Lactuca serriola*	küçük ağı marul, küçük eşek marolu	laitue serriole	prickly lettuce
qarûş, karîş, qarûç, bencere, bencira	*Sorghum halepense*	kanyas, geliç	sorgho d'Alep	Johnson grass
qerenfîl, qernefel, qurnefîl, mêxek, mêxik	*Dianthus*	karanfil	œillet	carnation
qesel mehmûd	*Teucrium chamaedrys*	kısa mahmut otu	germandrée petit-chêne	wall germander
qinêber	*Cardaria draba*	kır teresi, yabani tere	passerage, cardaire drave	hoary cress, hoary pepperwort
qirşsorik smartweed	*Polygonum lapathifolium*	ravend yapraklı çoban yaprağı	renouée à feuilles d'oseille	pale smartweed, dock-leaved
qurincok, giya qurincok, gorcal (zaza)	*Tribulus terrestris*	demir dikeni	tribule terrestre, croix-de-malte	caltrops
rebenok, mêlaq (cûreyek lale ye)	*Tulipa oculis-solis*	güneş gözü	variété de tulipe	a species of tulip
ribês, rêwas	*Rheum ribes*	ışgın	rhubarbe	rhubard
rihan, merzekene	*Ocimum basilicum*	fesleğen	basilic	sweet basil
rihana maran	*Salvia spp*	adaçayı	sauge	sage, clary
rîlik, rolik, rûl, ziqqum	*Nerium oleander*	zakkum, ağı çiçeği	laurier rose	oleander, rosebay
sabûnok	*Saponaria officinalis*	adi sabun otu	saponaire officinale, herbe à savon	soapwort
selmast, sêlmask, selmik, vilincê bizan (zaza)	*Chenopodium album*	akkaz ayağı	chénopode blanc, ansérine, chou gras	lamb's quarters, pigweed, goosefoot
sernixûnk	*Fritillaria persica*	acem ters lalesi	fritillaire de Perse	persian lily, persian fritillaria
sêva binerdê, sêvaxîn, saya binerdî	*Helianthus tuberosus*	yerelması	topinambour	Jerusalem artichoke
şirta çeman	*Calluna vulgaris*	adi süpürge çalısı	bruyère	heather
sîvanok	*Phlomis kurdica*	ayı kulağı	phlomis du Kurdistan	Kurdish sage
şoqilê hûr, mircor, çavreşk, baqilê hûr	*Vicia tetrasperma*	dört taneli fiğ	vesce à quatre graines	smooth tare
sorik, korek	*Panicum capillare*	kumdar, arnavut darısı	panic capillaire	witchgrass
sorsork, kitra sor, giyagêzk (gula wî : pîjildan, pîspîsk, pîspîsok, pîjik)	*Imperata cylindrica*	yelotu, kındıra, kan otu	paillote, paille de dys	cogon grass, blady grass
strîbeloq, strîşûjin, striyê çavbiloq, çavbeloq	*Centaurea*	deligöz	centaurée	centaurea
sumbil	*Hyacinthum orientalis*	sümbül	jacinthe	common hyacinth
şabelot	*Castane sativa*	kestane	châtaigne	sweet chestnut
şahtere	*Fumaria officinalis*	şahtere	fumeterre officinale	common fumitory
şembelîk, xencelîsk	*Trigonella foenum-graecum*	çemen	fenugrec, sénégrain, trigonelle	fenugreek
şeqşeqok, çeqçeqe	*Bongardia chrysogonum*	çatlak otu	bongardia	bongardia
şerabok, giya zirzirok, şofan	*Avena fatua*	yabani yulaf	folle avoine	wild oats
şêlmok, harik	*Sinapis arvensis*	yabani hardal	moutarde des champs	wild mustard
şîlan, gulşîlan, sûrgule	*Rosa canina*	kuşburnu	églantine	wild rose, dog rose, eglantine
şilêr	*Fritillaria*	ağlayan gelin	fritillaire	fritillary
şilêra sernixûnk	*Fritillaria persica*	acem ters lalesi	fritillaire de Perse	persian lily, persian fritillaria
şilêra sernuxwîn, şilêra sernixwînk, gulbenda şahî	*Fritillaria kurdica, Fritillaria imperialis*	ağlayan gelin, kral tuğu	fritillaire impériale (cette fleur est originaire du Kurdistan, pousse en altitude)	crown imperial
şînak, bedemçe, şivşînk	*Prunus arabica*	badem türü	variété d'amandier	prunus arabica
şirşirk, giyagenim, biragenim, xelvaş (zaza), şîlmok	*Bromus spp*	dibromlu	brome	brome grass
şolik, colik, şoqil, baqil, baqla, kêlih, kelî	*Lathyrus*	bezelye	pois	pea
şoqil, şolgenîk, baqilfisek, colgenî, kelîk, gasos (Bahdinan)	*Vicia sativa*	ehli fik, arpa fiği, buğday fiği	vesce	common vesce
şoqilê pisîkan, xişik	*Vicia hirsuta*	kaba tüylü fi	vesce hérissée	hairy tare
tîhnavk	*Labiate spp*	ballıbabagiller	variété de labiée	species of labiate
tiriyê dehlê	*Vaccinium myrtillus*	çoban üzümü	myrtille	whortleberry, blueberry
tiriyê hirçan	*Arctostaphylos uva-ursi*	ayı üzümü	busserole, raisin d'ours	bearberry
tiriyê maran	*Solanum nigrum*	köpek üzümü, köpek memesi	morelle noire	black nightshade
say mîrçikan	*Sorbus aucuparia*	kuş üvezi	sorbier des oiseleurs	mountain ash
tirşok, tirşoka xwarinê	*Rumex spp*	kuzukulağı	oseille	sorrel
tirşok, tirşoke	*Rumex acetosa*	kuzukulağı	oseille des prés	common sorrel
tirşoka gayan	*Rumex obtusifolius*	küt yapraklı labada	patience obtuse	broad-leaved dock
tirşoka keran	*Rumex dentatus*	labada	(oseille non comestible)	indian sorrel, toothed dock
tirşoka kewan	*Rumex acetosella*	küçük kuzukulağı	fausse oseille, petite oseille	sheep's sorrel, small sorrel
tirşoka zinaran	*Rumex crispus*	kıvırık labada	patience crépue	curly dock
tolik, xamazek (zaza)	*Malva neglecta*	ebegümeci	mauve à feuilles rondes	dwarf mallow
tûtirşk, drîsork	*Rubus idaeus*	ahu dudu	framboisier	raspberry
xelîlok, pêlegleg, xilok, poşmê, poşmêz (zaza)	*Geranium spp*	turnagagası	géranium	geranium
xerdela bejî, xerdela reş	*Brassica nigra*	kara hardel	moutarde noire	black mustard
xilîk, hilîk, hilûreşk	*Prunus spinosa*	çakal eriği	prunellier, épinette, épine noire	sloe, blackthorn
xweşîl, taleşîr, şîrmar, xagşîr, xwelîşîrik, şîrik, şîroke, delêk (zaza)	*Euphorbia helioscopia*	seher otu	euphorbe réveil-matin	sun spurge, wartweed
zimanxwînk, zeliqok, nûsek, nwîsek, padûseh (zaza), dûgune	*Gallium aparine*	yapışkan otu	gaillet, gratteron	goosegrass, cleavers
zingilzava, tusiyê keran	*Eryngium spp*	boğa dikeni	panicaut (variété de chardon)	sea holly, eryngo
zirtiq, fistiqa erdê, fisteqê bierdkî	*Arachis hypogaea*	yer fıstığı	arachide	peanut, groundnut, monkey nut
zirtolik, tolika keran, xamezeka sûre	*Malva sylvestris*	büyük ebegümeci	grande mauve	common mallow
kimê, dobelan	*Ascomycetes hypogés*	yermantarı, domalan	truffe	truffle
kimeya reş	*Tuber melanosporum*	kara yermantarı	truffe noire	black truffle
şoqilê hûr, mircor, çavresk, baqilê hûr	*Vicia tetrasperma*	dört taneli fiğ	vesce à quatre graines, lentillon, cicerole	smooth tare
beybûna mêrgan	*Leucanthenum vulgare*	çayır papatyası	marguerite de prés	ox-eye daisy
gurnîg, gurnîgamêş, gûrnûk, mwîsek	*Xanthium strumarium*	hakiki sıraca otu	lampourde aux écrouelles, lampourde glouteron	rough cockleburr
behîva bejî, badema çiya, çaqale	*Prunus carduchorum*	yabani badem	variété d'amandier	almond tree


Achillea millefolium, bêwîjan, pûjang, gulikê maran


Aconitum napellus, gurxenêq, kerxenêq


Agropyron repens, firêz (li hin deveran)


Alcea kurdica, hêro


Amaranthus retroflexus, koksor, lûexandir (zaza)


Annagyris foetida, kêrat, qereqaç


Anchusa azurea kurdica, gûriz, golmize, zimanê ga


Anchusa officinalis, guriz, gelziwan (zaza), gurisk


Anemone coranaria, adarok, gulalesûre, kurikmast


Arum maculatum, karî, kardî, kardû, marmaroşk


Asparagus officinalis, meroje, merje, mîrajo


Atriplex hastata, kerbalcana bejî


Avena fatua, şerabok, giya zirzirok, şofan


Bellevalia, gêleqir


Boraginaceae, kevlepîr


Brassica nigra, xerdela bejî, xerdela reş


Bromus spp, şirşirk, giyagenim, biragenim, xelvaş (zaza), şîlmok


Calendula arvensis, gula çavêşê, hemîşe bihar


Capsella bursa pastoris, kîsikê şivanî, tûrikê şivanan, tarek (zaza)


Cardamine hirsuta, bendika avî, vîzdorik (zaza)


Cardaria draba, qinêber


Centaurea, strîbeloq, strîşûjin, striyê çavbiloq, çavbeloq



Chenopodium album, selmast, sêlmask, selmik, vilincê bizan (zaza)


*Equisetum arvense,*dûvikê hespê, sipingê maran, singê maran, şitlê xezalan, tilîper, rûnîn (zaza), vaşbitrî (zaza)



Echinochloa crusgalli, darucan, şêrpûg


Hedera helix, dargerînk, daralînk, badar


Merendera kurdica, colchicum kurdica, kulîlka cotarî, hanhanek, ciwanemerg, pîvok


Euphorbia helioscopia, xweşîl, taleşîr, şîrmar, xagşîr, xwelîşîrik, şîrik, şîroke, delêk (zaza)


Fumaria officinalis, şahtere


Gallium aparine, zimanxwînk, zeliqok, nûsek, nwîsek, padûseh (zaza), dûgune


*Heliotropium europaeum,*giyagewrik, kifkedûpişk, giyadûpişk, vaşogewr (zaza)


Hesperis kurdica, qaçmûk, şewbor



Brassica oleracea, kelem


Lamium spp, hingivîn, mijmijok, vaşê mêşan (zaza)


Lathyrus tuberosus, colbenî, şolikê maran, baqilê maran, kelîmar


Linum, kitan, kitaf, guş


*Lolium temulentum,*çîm, giyareş



Malva neglecta, tolik, xamazek (zaza)


*Matricaria chamomilla,*beybûn, beybûna demanan, babûnc


*Mentha arvensis,*pûjan, naneya bejî


Myosotis arvensis, guriz, gelziwan, gûriz, gwîriz


Panicum capillare, sorik, korek


Papaver rhoea, bûkik, bûkanî, bûk, bwîk, nîsanok, patpatok, patpatole, bûkûzava, gulenîsan, rêywek


*Phaseolus vulgaris,*fasûlî, fasûlye, fasolî, fasla (zaza)


Phlomis grandiflora, guhbelok


Phlomis kurdica, sîvanok


Polygonum lapathifolium, qirşsorik


Polygonum persicaria, mastêrk, sinbêleşên (zaza)


*Portulaca oleracea,*pirpar, parpar, pêpîne


*Rumex obtusifolius,*tirşoka gayan

Termên rojnamevaniyê

Amadekar : Newzad HIRÛRÎ

kurmancî	tirkî	fransizî	îngilîzî
reklam	reklam	réclame, publicité	advertisement
reklam kirin	reklam yapmak	faire la réclame, faire la publicité	to advertise
reklamger	reklamcı	publiciste	advertiser
reklamgerî	reklamcılık	publicité	advertising, publicity
agahdarî	enformasyon	information	information
analîz	analiz	analyse	analysis
analîz kirin (n.f.)	analiz etmek	analyser	to analyze
analîst	analist	analyste	analyser
jînenigarî, jiyanname	biyografi	biographie	biography
peqoşk, peqoşka axaftinê, balon	balon	bulle (de BD)	balloon
bandrol	bandrol	banderole,	banner
diruşm (n.f.)	1) bayrak, sancak 2) slogan	1) bannière 2) slogan, mot d'ordre	1) banner 2) slogan
stûr, tîpên stûr	kalın harfler	caractère gras	bold
weşandin	yayınlamak	publier, diffuser	to broadcast
weşan	yayınlama, yayın	diffusion, publication	broadcasting
klîp	klip	clip	clip
têgeh (n.f.)	kavram, mefhum	concept	concept
têgehî	kovramsal	conceptuel	conceptual
têgehbar	kavranabilir, anlaşılabilir	concevable	conceivable
netêgehbar	anlaşılamaz, kavranamaz	inconcevable	unconceivable
mafê weşanê	telif hakkı	droit d'auteur	copyright

Dezgehên dewletê

Amadekar : Samî ERGOŞÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
birêveber, rêveber	müdür	directeur	director
birêveberî, rêveberî	müdürlük	direction	directorate
navxwe	iç	interne	internal
navxweyî	dahili, iç	intérieur	internal, interior
elektrîk, kareba	elektrik	électricité	electricity, power
birêveberiya belavkirina elektrîkê (an karebayê)	elektrik dağıtım müdürlüğü	direction de distribution de l'électricité	electric power distribution directorate
sexbêrî	bakım	entretien	maintenance
tora elektrîkê (karebayê)	elektrik şebekesi	réseau électrique	power grid
avero	lağım, kanalizasyon	tout-à-l'égoût	sewers
birêveberiya av û averoyan	su ve kanalizasyon müdürlüğü	direction des eaux et des égoûts	directorate of water supply and sewage
birêveberiya kar û cîwarkirinê	istihdam ve iskan müdürlüğü	direction de l'emploi et du logement	directory of employment and housing
birêveberiya çandiniyê	ziraat müdürlüğü	direction de l'agriculture	directorate of agriculture
saman	kaynak, servet	ressource	resource
samanên ajelî	hayvan kaynakları	ressources animales	animal ressources
birêveberiya samanên ajelî û beytariyê	hayvan kaynakları ve baytarlık müdürlüğü	direction des ressources animales et des services vétérinaires	directorate of animal ressources and veterinarian services
birêveberiya gumrikê	gümrük müdürlüğü	direction des douanes	directorate of customs
plankirina bajêr	şehir planlaması	planification urbaine	city planing
birêveberiya gencîneyê	hazine müdürlüğü	direction du trésor	directorate of treasure or exchequer
birêveberiya weqfan û karûbarên dînî	vakıflar ve din işleri müdürlüğü	direction des biens de main-morte et des affaires religieuses	directory of mortmain and religious trusts
birêveberiya tapoyê	tapu müdürlüğü	direction des titres de propriété	land registry directory
birêveberiya baca hatiniyê (an derametê)	gelir vergisi müdürlüğü	direction de l'impôt sur le revenu	directorate of income tax
birêveberiya çavderiya bazirganiyê	ticaret denetleme müdürlüğü	direction de surveillance du commerce	directory of trade supervision/control
birêveberiya belavkirina sotemeniyê (an ardûyê)	yakıt dağıtım müdürlüğü	direction de distribution des combustibles	directory of fuel distribution
birêveberiya karûbarên civakî	sosyal işler müdürlüğü	direction des affaires sociales	directorate of social welfare
birêveberiya çavderiya darayî	maliye denetleme müdürlüğü	direction de contrôle financier	financial audit directory
birêveberiya spor (an werziş) û ciwanan	spor ve gençlik müdürlüğü	direction des sports et de la jeunesse	directorate of sports and youth
sindoqa çavdêriya malbatan	aile yardım sandığı	fonds d'aide aux familles	familly assistance fund
birêveberiya giştî ya perwerdeyê	eğitim genel müdürlüğü	direction générale de l'éducation	general directorate of education
birêveberiya perwerdeyê ya Dihokê	Dihok eğitim müdürlüğü	direction de l'éducation de Dihok	Dihok directory of education
taqîgeha keresteyên avakirinê	inşaat malzemeleri laboratuarı	laboratoire des matériaux de construction	building materials testing laboratory
birêveberiya pasportê	pasaport müdürlüğü	direction des passeports	passport office
birêveberiya polîsên parêzgeha (wîlayeta) Dihokê	Dihok vilayeti polis müdürlüğü	direction de la police du département de Dihok	police directory of Dihok county or province
birêveberiya ewlekariyê ya Dihokê	Dihok emniyet müdürlüğü	direction de la sûreté de Dihok	Dihok directorate of security
birêveberiya trafîkê	trafik müdürlüğü	direction du trafic	traffic directory
birêveberiya ava binerd	yeraltı suları müdürlüğü	direction des eaux-souterraines	directory of subterranean waters
birêveberiya nifûsê	nüfus müdürlüğü	direction de l'état-civil	directory of civil status
birêveberiya çalakiyên dibistanan	okul etkinlikleri müdürlüğü	direction d'activités scolaires	directory of school activities
birêveberiya polîsên hawarê	imdat polisi müdürlüğü	direction de la police de secours	directory of emergency services
birêveberiya agirkujiyê	itfaiye müdürlüğü	direction des pompiers	fire brigade directory
serokatiya zanîngeha Dihokê	Dihok üniversitesi başkanlığı	présidence de l'université de Dihok	presidence of Dihok university
birêveberiya şaredariya Dihokê	Dihok belediye müdürlüğü	direction de la municipalité de Dihok	Dihok municipal directory
birêveberiya tendirustiyê	sağlık müdürlüğü	direction de la santé	directory of health
birêveberiya statîstîkê (an amarê)	istatistik müdürlüğü	direction de la statistique	directory of statistics
birêveberiya karkenariyê	emeklilik müdürlüğü	direction des retraités	directory of pensioners
birêveberiya şûnewarên kevnare	eski eserler müdürlüğü	direction des sites archéologiques	directory of archaeological sites
odeya bazirganiyê	ticaret odası	chambre de commerce	chamber of commerce
birêveberiya ava gundan	köy suları müdürlüğü	direction des eaux pour les villages	village water supply directory
kompanya tiştên xwarinê	gıda maddeleri şirketi	compagnie de l'alimentation générale	compagny of staple food stupply
birêveberiya avdanê	sulama müdürlüğü	direction de l'irrigation	directory of irrigation

Di kurdî de binavkirina nebatan

Amadekar: Ehmedê DIRIHÎ

Gelo di zimanên din de û di zimanê kurdî (kurmancî (**k**) û zazakî (**z**) = kirmanckî/kirdkî/dimilkî) de nebat çawa tên bi nav kirin? Binavkirina nebatan tê vê manayê: Bi navên sade û yekhejmar ên îlmî binavkirina nebat û grûba nebatan û danîna qaydeyan. Navên latînî hem direj in û hem jî gotina wan zehmet e. Lêbelê li dinyayê navên nebatan ên îlmî, bi latînî tên dayîn. Ji van navan re "**navên botanîkî**" tê gotin. Di ferhengan de jî, wek **bot** (*Morus alba*) tê nivîsîn.
Di vê nivîsarê de, min binavkirina nebatan bi kurdî (bi du zaravayên kurdî) û latînî dane ber hev. Çawa dişibihin hev, çawa tên wesifandin û manaya wesifan nîşan didin.
Ji bo navên bi kurmancî min tîpa (k) û bi zazakî jî tîpa (z) danîye ber. Ger nav di her du zaravayan de muşterek be, min tiştek nedanîye ber.
Di amadekirina vê lêkolînê de keda birayên min kek Malmîsanij û kek Roşan Lezgîn gelek e. Wan di her warî de alîkarîya min kir û bi zanyarî û pêşniyarên xwe ev xebat dewlemendtir kirin. Ez gelekî spasî wan dikim. Herweha gelekî spasdarê kek Malmîsanij im ku wî ev ji zaravayê zazakî kiriye kurmancî.

1) Hin nebat navên xwe yên latînî, ji peyvên *kurd, carduchorum, Kurdistan* yan jî herêmên Kurdîstanê werdigrin. Çend nimûne:

Latînî	**Kurdî**
Alcea **kurdica**	hîro/hêro
Cirsium **carduchorum**	vergvaş (z)
Paeonia mascula **kurdistanica**	heşvil, savil (z)
Merendera **kurdica**	kulîlka cotarî, hanhanek, pîvok (k)
Centaurea **kurdica**	baxox, angelok, kanêje (k)
Astragalus **kurdicus**	
Paracaryum **kurdistanicum**	
Verbascum **kurdicum**	

Li vir "kurdistanica" varyete ye û maneya "yê Kurdistanê / ji Kurdistanê, kurdistanî" dide, "carduchorum" jî bi maneya "yê kurdan" e.

2) Di latînî de, tenê navekî rast û îlmî yê her nebatê heye. Ji vî navî re "binomial" tê gotin û her cinsek bi du peyvan tê bi nav kirin. Nimûne:

Latînî	**Kurdî**
Morus alba	tuya sipî (z), tûya spî (k)

Manaya "morus"ê, di kurdî de "tuye"/"tû" ye, manaya "alba" jî di kurdî de "sipî" ye.

3) Di zimanê kurdî de navên nebatan, piranî bi îzafeya navdêran yan jî bi îzafeya rengdêran e. **Nimûne:**
şitlên **xezalan** (k); kekvila **zerde** (z); sosina **awe** (z)

4) Di binavkirina nebatan de mirov reng, bêhn, tehm, şikil û cîyê ku lê hêşîn dibe dide ber çavan.

5) Hin nebat jî bi navên heywanan tên bi nav kirin. **Nimûne:**
nanê **mirîşk**an (k); tirşikê **gayan** (z); tirşoka **gayan** (k); zûlê **kesayan** (z); adirokê **heşî** (z); dimê **lûyî** (z).

Heke navê heywanan li pêşîyê be, yekhejmara wî tê bi kar anîn. **Nimûne:**
dîkpenc (k); **mar**şing (k); **şêr**pûg (k); **verg**vaş (z); **xoz**mêw (z)

6) Di kurdî de carna hece tekrar dibe û li dû wan paşgira "-ik" yan jî "-ok"ê tê, bi vî hawî navê nebatê çêdibe. **Nimûne:**
bizbizok; **hedhed**ik (k); **reşreşik** (k); **kirkir**ok (k); **lavlavk** (k); **parpar** (z); **qumqum**ok; **sorsor**ik (k); **tajtajik**; **wahwah**ok; **xişxişik**; **xumxum**ik

7) Di latînî û kurdî de, bi pêşgir û paşgiran jî navên nebatan çêdibin.

ZAYEND (NÊR Û MÊ)

Di latînî de zayenda navan heye. Nav yan nêr, yan mê û yan jî notr in. Zayend bi paşgiran tên nimandin.

nêr	**mê**	**notr**	**nimûne**	**maneya peyvê**
-us	-a	-um	albus, alba, album	sipî
-er	-ra	-rum	niger, nigra, nigrum	reş(k), sîya(z)
-is	-is	-e	brevis, brevis, breve	kilm, kirr
-r	-ris	-re	acer, acris, acre	tal (k), cal (z)

Di kurdî de, di navan de zayend, yanî **nêr** û **mê** heye. Nebat li gor **zayenda** xwe tên bi nav kirin.
Di îzafeya zazakî de paşgirên nêr "**-ê**" û "**-o**", paşgirên mê jî "**-a**" û "**-e**" ne. Di zaravayê kurmancî de, paşgira mê "**-a**" û paşgira nêr jî "**-ê**" ye.

1) Navên **dar**an mê ne.
hebîk**ê**ra argoşan (z)
sayêra mîrçikan (z)
dar**a** bîyê (k)
dar**a** sêvê (k)

2) Di zaravayê zazakî de navên **birr**an (z) (= **devî** (k)) nêr in. Lê di kurmancî de mê ne û di halê pirhejmarîyê de têne bi kar anîn.
birr**ê** qalî (z); gez**o** sûrin (z); şitl**ê**(**n**) xezalan (k); şirt**ê**(**n**) çeman (k)

3) Navên **fêkî**yan mê ne.
alûnç**a** tirşe (z); momix**a** reş (k); sêv**a** bejî (k)

4) Navê **kevzê** mê ye.
kevza awe (z); kevza avê (k)

5) Navên nebatên **alifî** yên **baqleyî** mê ne.
neflika sipî (z); argu**da** bej (z); nefela sipî (k) kizina reş (k)

6) Navên nebatên **alifî** yên **genimî** nêr in.
xelvaş (z); çîm; giyareş (k)

7) Navên **kulîlk**an mê ne.
vilika kutikan (z); binefşa belek (k); sosina avê (k)

8) Navên **sewze**yan bi piranî mê ne. Tenê yên ku dişibihin organa nêrtîyê, hinek jî wan nêr in (xiyar, balcan, kundir û hwd).
îsoto sûr (z); xeyarê payîzî (z); xiyarê bejî (k)
kundirê dolmikan (k); balcanê reş (k)

A) NAVÊN NEBATANÊN KU ÎZAFE NE

Di kurdî de navên hin nebatan wek îzafeya navdêran yan jî îzafeya rengdêran e.

Îzafeya navdêran:
fisa **vergî** (z)
nequrê **leglegî** (z)
saya **argoşan** (z)
vilincê **bizan** (z)
neynûka **bûkê** (k)
baqilên **keran** (k)

Îzafeya rengdêran:
girnûga **gilore** (z); pêçeka **sipî** (z)
garisê **stenbolî** (k); kundirên **mîranî** (k)

Navên tewirên nebatan gelek caran bi îzafe ne. Wek nimûne ez çend tewirên "beqla/bakla", "neflike", "tuye" û "qerqaşe" dinivîsim:
beqlaya **gayan**/ bakla **gayan**
beqlaya **heran**/bakla **heran** (z)
beqlaya **maran**/bakla **maran**
beqlaya **mîrçikan**/bakla **mîrçikan** (z)
beqlaya **pisîngan**/bakla **pisîkan**
beqlaya **sultanî**
beqlaya **xatunan** / bakla **xatunan** / bakla **xatunî**
neflika **sipî** (z); neflika **sûre** (z)
neflika **zerde** (z); tuya **qere** (z)
tuya **sîyaye** (z); tuya **sipî** (z)
tuya **sûre** (z); tuya **tirşe** (z)
tuya **ximrî**/tuya **xumrî** (z)
qerqaşa **payîzî** (z); qerqaşa **wesarî** (z)

B) HIN TAYBETMENDÎYÊN DINÊN NAVÊN NEBATAN

Li gor hin taybetmendîyên wan, meriv dikare li ser navên din ên nebatan weha bibêje:

1) Navên nebatan ên bi peyvên "**awe**" (z)/ **avî** (k) û "**varte**" (z):
bencra **awî** (z); kuya **awî** (z); sungê **vartî** (z)

2) Navên nebatên **yabanî**:
ce**wek** (z); cew**vaş** (z)
korek**vaş** (z); sîr**vaş** (z); şilêl**vaş** (z)
încila **zuray**/încila **zûre** (z); nehaya **bejî**/nehaya **bêjî** (z); qewaxa **pînce** (z)
sa**yek**/saya **borî** (z); sîr**ik**
tirşika **zurayine**/tirşika **zureyîne** (z)
val**bor**/vala **borî** (z)

3) Navên nebatan ên li gor **cîyan**:
asmîn (z); **binerd**ik (k); gul**dîwar** (k); incasa **malta**yê (k); saya **binerdî** (z)

4) Navên nebatan ên li gor **alîyan** (**cîhet**an):
vasê **veraroj** (z); **verroj**/ **verrojik**/ **verarojk**/ gula **ver**verojî (z); gula **berbiroj** /gul**berojk** (k)

5) Bi peyvên **bawerîyê**:
cehnemî; cenet-cehnem; kînger**nebî;** kuya **şêxanî** (z)

6) Bi peyvên **cinsîyetê**:
dêlek (z); **dêle**şit (z)

7) Bi peyvên **demê** (**wext**):
adarok; gula **adarê** (k); gul**enîsan** (k); kulîlka **gulanê** (k); kuya **zimistanî** (z)

8) Bi peyvên **merivatîyê**:
vêywek (z); **bûk**ik (k); **xalcînek** (z)

9) Bi navên **kesan**:
elik-fatik (k); **meyrem**xort (k)

10) Bi navên **mîtolojîk**:
newroz

11) Bi peyvên **tibî** (**hekîmtîyê**):
tadar; vaşê **tenşîyî** (z); giyayê **balûkê** (k)

12) Bi peyvên bona xususîyetên **jin**an:
beqlaya **xatun**an/**xatun**î,
bakla **xatun**an/**xatun**î
tarrê **xatune** (z); tirşoka **xatune; xatune; xatun**ek

13) Bi peyvên **xwarinê**:
nanê mîrçikan (z); **rûnî**; **rûnîn**

14) Bi navên **wesilan** (**organ**an):
bilikê heşî (z); **çimê** pisîngan, **çimga** (z); **çavga** (k); **goş**goz; **pence**şêr; **pence**xanim

15) Bi peyvên **şekil**an:
girnûga **gilor;** pel**pihûn** (z); **punc**vaş /**pûnc**vaş (z)

16) Bi navên **eşyayan**:
giştonek (z); gul**borî;** gul**zirnayî**; **lûle**per mas**têr**ek; **qebqabik; rêzile** (z); **zel** (z)

17) Bi navên **çekan**:
rim; singoyê îspanî; **şimşîrî**
topiz; xencere

18) Bi navên **heywan**an:
binevşa **seg** (k); **bûkegur** (k)**;** derpêkê **dîk** (k); dilqoka **her**an (z); dirrrika **devan**; fise**gur** (k); gelzûnê **mîrçik**an (z); giya**beraz** (k); goşê **kutik**an (z); goşt**berx**ik (k); guh**mişk** (k); gun**pîsik** (k); gurnigê **gamêşî**; hebikê **argoşan**/saya **argoşan** (z); kardûnê **heşî** (z); kerenga **kûsî** (k); kerika **berxo** (k); kîngerê **her**an (z); kuvarkê **bizinkî** (k); kuvarkê **mîkî** (k); lepehir**ç** (k); luzê **kesayan** (z); **marmar**oşk (k); **masî**jehr (k); merze**kew** (k); **mêşxwur**/**mêşgir** (k); nefela pîyê **balinde**yî (k); pê**canik** (k); pî**qaze** (k); piranê **meşnan** (z); rihana **mar**an; rîşê **bizinê** (k); sawinê **mîrçikan** (z); sungê **mar**an; şaxe**ask** (k); telîyê **merrayan**/**mir**teli (z); teliyê **mozikan** (z); tirîyê mamê **rûvî** (k); tizbîyê **dewarî**; vasê **kekan** (z); vasê **leglêg** (z); vasê **pisîngan** (z); va**şzerenc** (z); **vergvaş** (z); vile**heş**/**heş**vil, vil**heşik** (z); vilika **kutik**an (z); vilincê **bizan** (z); **xozmêwe** (z); zebata **pilingî** (k)

19) Bi navên **hejmaran**:
çarteli/**çar**telu (z); **çarçal**/**çarçar**; **çel**pere (k)**;** **dimor**/**dimol**; gula **şêst**per (k); **hezar**gez; **hezarreng**; **hezar**tere

20) Bi peyva "**boye**" (z) (bi kurmancî "bêhn"):
boyinvaş (z); şew**boy**

21) Bi peyvên **tehmê**:
bîbero **şîrîn** (z); helû**tirşik** (z); engura **şekerî** (z); engura **şerabî** (z); **şekir**ok; **tal**eke/**tal**eki, **tal**ik (z); **tal**ika zerencan (z); **tirş**inge/**tirş**ingî; **tirş**ik; **tirşikêre** (z); vasê **hemgînî** (z); zebeşa **tahle** (z)

22) Bi peyvên **rengan**:
belg**îzer**; beng**zerik**; binevşa **belek** (k)**;** çav**zerk** (k); engura **qerî** (z); engura **sûrî** (z); gilgilo **sipî**/girgilo **sipî** (z); goza **sîyaye** (z); gula **sûre** (z); gule**zer**; gul**zêr** (z); gul**zêrîn**; heb**reş** (k); îsoto **sipî** (z); kef**zer**, kev**zer**; kekvila **sipî** (z); kelemo **sûr** (z); kevza **zerkesk**; kevza**reş** (k); kok**sûre** (z); kovikê **erxiwanî** (k); kum**sûre** (z); **lalengî** (rengê mandalîn e); lêmeka **sipîye** (z); mex**mork**; sîrê kumik**mor** (k); **sor**kelem (k); sosina **sipî** (z); **sûr**dar/**sûre**dar (z)
sûrgule/**sûr**gul, **sûr**gulik (z)
sûrince/**sûr**inci/**sûr**inc/**sor**ince/**sûr**ûnç (z)
sûrvaş (z); tarro **sûr** (z); telîyo **sîya**/teluyo **sîya**/**sîya**teli (z); telîyo **zerd** (z)**;** tirewa **sûre** (z)**;** tû**reşk** (k); vaşo **gewr** (z); vila **çeqere** (z); xamazeka/xanzeka/ximazeka/xamzeka
sûre (z)**;** xerdelo **sîya; zer**goz; **zer**zeng

23) Bi peyva "**bin**":
binerdî; **bin**gozik

24) Bi peyva "**dare**"/"**dar**":
darbenîşt; **dar**çîn; **dar**gez; **dar**hulu (k); **dar**şilêr; **dar**tizbî ; **dar**ziravik (k);

gen**dar**/sûr**dar** (z)**;** gul**dar; dara**lînk; **dare**nan (z); dê**dar**; mele**dar**
hişk**dar** / wişk**dar** (z)

25) Bi peyva "**gule**"/"**gul**":
gulbend; **gul**menşag (z); **gul**nêrgiz; **gul**qedîfe; **gul**zer; **gul**bej; **gul**bihar (k); **gul**kelem; **gul**nexwûn (k); **gula** adar; **gula** çavêşê (k); **gula** hesretê (k); **gule**bêmiraz (k); **gul**ehingvîn (k); **gul**emî; şev**gul**

26) Bi peyva "**şa**"/"**şah**":
şagul; **şa**baqil; **şa**belû; **şa**belûyêre/**şa**blêre"/"**şa**lbêre (z)

27) Bi peyva "**vaş**" (z) yan jî "**giya**" (k):
vaşê bitrî (z); **vaş**ê derban (z); **vaş**ê genimî (z); **vaş**o nemir (z); **vaş**ê sawinî (z); **vaş**ê şitî (z); **vaş**ê tuzbeyan/vaşê tuzbûn (z); **vaş**ê ziwanok (z)

giyabehlûlk (k); **giya**civa (k); **giya**gewrik (k); **giya**girêçk (k); **giya**jehrik (k); **giya**mêşxur (k); **giya**şermîn (k); **giya**yê ferîşteyî (k); **giya**yê xanimê (k); **giya**yê kirman (k); hêz**giya** (k); hirç**giya** (k)**;** şûr**giya** (k)

28) Bi peyva "**telî**"/"**teli**"/"**telu**" (z) yan jî "**stirî**" (k):
mir**teli** (z)**;** sîya**teli** (z)

agir**stirî** (k); **stirî**beloq (k); **stirî**k (k); **stirî**mişk; **stirî**per (k); **stirî**yên çavbeloq (k); **stirî**yên gêxanê (k); **stirî**yên maran (k); **stirî**zerk (k)

29) Bi peyva "**vile**"/"**vil**", "**vilike**"/ "**vilik**" (z) yan jî "**kulîlk**" (k):
ça**vil** (z)**;** heş**vil** (z)**;** kek**vil** (z)**;** koz**vilik** (z)**;** sa**vil**/sa**vul** (z)**;** **vil**heşik (z)

kulîlka bayê (k); **kulîlka** cotarî (k); **kulîlka** gizbelokê (k); **kulîlka** hespan (k); **kulîlka** hesretê (k); **kulîlka** newalan (k); **kulîlka** nîsanê (k); **kulîlka** qesar (k); **kulîlka** şewatê (k); **kulîlka** tolgînê (k); **kulîlka** xezalan (k); **kulîlka** zehferan (k)

30) Bi peyva "**pîvaz**" (k):
pîvaza çolê (k); **pîvaza** guran (k); **pîvaza** hirçan (k); **pîvaza** kuçikan (k); **pîvaza** kurdî (k); **pîvaza** kuvî (k); **pîvaza** maran (k); **pîvaza** genî (k); **pîvazî** (k); **pîvaz**ok (k); **pîvaz**xag (k)

31) Hin navên nebatan bi tekrarkirina peyvekê çêdibin:
kefkefok; **mijmij**ok; **peqpeq**ok; **şeqşeq**ok; **tastas**ik; **teptep**ik; **teqteq**ok; **xaşxaş**ik

C) YÊN KU BI PÊŞGIRAN ÇÊBÛNE

bê-
fasulyeya **bê**dasî/faslêya **bê**dasî (k)
gorcala **bê**teli (z); gula **bê**miraz (k)
vila **bê**koke (z); vaşo **bê**kok (z)

zir-
Pêşgira "**zir-**" maneya "yabanî" û "sexte, nerast" dide. **Nimûne:**
zirbaqle (k); **zir**catir (k); **zir**fistiq (k); **zir**hewr (k); **zir**hêjîr (k); **zir**leylanq (z); **zir**sosin (k); **zir**şemamok (k); **zir**tolike (z)

Ç) YÊN KU BI PAŞGIRAN ÇÊBÛNE

-eke/-eki/-ek/-k
derzîn**ek**
kelaw**ek** (z)
kor**ek** (z); lêm**ek** (z); padus**eke**/padus**eki**/padus**ek** (z); say**ek** (z); sînz**ek** (z); şîrz**ek** (z) vey**veke**/vey**wek** (z)

-êre
alûnç**êre** (z); bey**êre** (z); dirrik**êre** (z); findiq**êre** (z); goz**êre** (z); henar**êre**/nalb**êre** (z); kinay**êre** (z); lûxp**êre** (z); mahşl**êre**/maşl**êre** (z); payîz**êre** (z); qêlik**êre** (z)**;** say**êre** (z); tey**êre** (z); val**êre** (z); vam**êre** (z); xib**êre** (z); zerdalîy**êre** (z)

-ik
derzîn**ik**/dêrzîn**ik**; gez**ik**; sûrpenc**ik** (z); sûs**ik**; şirt**ik**

-in/-yin/-în/-yîn
pilx**in** (z); tarro gilerzg**în** (z); telî**yin**/telu**yin** (z); zer**în** (z)

-ok
adir**ok**; gez**ok**; kizn**ok**; silq**ok**; sîrm**ok**; şeq**ok**; tirş**ok**; xezal**ok**; zengil**ok**

D) NAVÊN KU BI FORMÊN CIHÊ TÊNE GOTIN

hirmî (k): hermê, hermî, hermû, hurmî, hurmê
tirî (k): tirih, turî
murî (z): meroe, meroy, miro, miroy, mirwa, mirwi, mura, murîye, murû, mûrû

E) NEBATÊN KU BI NAVEKÎ TÊNE GOTIN

Kurdî	Latînî
Anix	Satureja hortensis
Anix	Mentha arvensis
Anix	Mentha longifolia
Anix	Pimpinella anisum
Anix	Thymus fallax
Anix	Origanum munzurense

G) JI NAVÊN NEBATAN ÇEND GOTINÊN PÊŞÎYAN Û ÎDYOM

Zazakî:

Îdyom:

Awe dekewtiş **şekok**e.
Beng werdiş.
Bi qasê **goze** bîyayîş la **gozêre** ra qisey kerdiş.
Çûleyê **vame** denêkerdiş.
Deyî şarî gay û bizî, deyî mi **gulnêrgîzî**.
Hênî pûne ra aciz o, **pûne** zî şino çimeyê hênî de beno zergûn.
Herdîşe **xas**, qine **pîyaz** bîyayîş**.**
Kêna şargê **gul**an a, waştîya vîst û hewt tenan a.
Korek dest ra nêrişîyayîş.
Mesela **sîr** û **pîyaz** kerdiş.
Mi eşt **gozêre**, şi gina **mazêre**.
Mi eşt **sayêre**, şi ame **tuyêre**.
Mîze verdeno **telî**, keno wişk.
Ne **pîyaz** werdiş, ne fek veşayîş.
Neheyê serê tahte bîyayîş.
Pele **kelmayêre** bîyayîş.
Sey girê **darî** bîyayîş.
Sey **pirparî** zêdîyayîş.
Sîr û **pîyaz** ra qisey kerdiş.
Şemo birayî Mamî, **gozan** bedelneno bi **vamî**.
To **vile** dîy, tira darû çîy.
Xele bi firîk, mele bi şirîk.
Zîre **korekî** vîyartiş.

Gotinên pêşîyan:

Gozê pûçî xirexir kenê.
Her **vaş** kokê xo ser o beno zergûn.
Pîyaz çiqas firk bo ende sere keno pîl.
Sereyê **pîyazî**, qina **pîyazî** yew î!
Welî ra **telî**, **telîyî** ra welî kuweno.

Kurmancî:

Îdyom:

Ava goşt û **balcan**a, ne xwar ne da cîrana.
Ava ser **berûy**an, wek zavayê dilê xesûyan.
Avîlok zî nexşê xwedê ye.
Baxçê **gul**a, para bêaqila.
Berû ji darê ketî, dar nasnekirî.
Bi dilê keran bimîne, qevdek **baxdenûs** namîne.
Bi eşqa **mewija**, dil diçe **guvîja**.
Bi serîyek **sîr** nekirin.
Bi şev **şemamok** bi roj pîrebok bûyin.
Bizrê **pirparê** bûyîn.
Bo xatirê **gulê**, **dirik** dikeve paşîlê.
Bûyîn **dirika reş.**
Bûyîn **îsot.**
Çelleyê erebî û **firîgên nokan**?!.
Çi zanit qedrê **gulê**, kerbeş divêt kerê reş.
Çil kilamên hirçî ne, hemû jî li ser dara **hermî** ne.
Darê min kulavê min, rehmet li dê û bavê min.
Dibê qey **sêv**ek e, kirine du felq. (Teşbîh)
Dimirim dibiecim; **ceh** dibêjê ez **birinc** im.
te can e, ê me **balcan** e?/ te can e, ê min **balcan** e?.
Endilko bavê keko, tekê min o, tekê keko.
Garis ji destan nerijîn.
Gayê fiso, nan **garis** o!.
Gula geş dane ber pozê kerê reş.
Ha namûs ha **baxdenûs**!.
Heft çîrokê hirçê ne, her heft jî li ser **hermê** ne.
Heke **xiyar** e, ji tûtikê ve dîyar e.
Herçî ber e, **gula zer** e.
Heya herî bigre **xernûf**.
Hezîran hizirî, **giya** li baskê kizirî.
Kakilê **gûzê** bûyin.
Kes **pîvaz**an pê hûr nake.
Kirin wek **pincar.**
Li ser **dirik**an rûniştîn.
Lomeya **pîvaz** ji **sîr** kirin.
Mala bavan **gula** geş, mala mêran roja reş.
Maneya nedayînê, "werîs li **garis** e.".
Mar ji **pûng**ê aciz e, **pûng** jî diçe li ber qula wî hêşîn tê.
Min **sîr** nexwarîye ku bîhn ji devê min bê!.
Nan heye, av heye, **pîvaz** heye, lo lo tu çima dimirî?.
Nav gîya de **tolikê** begemkirin.
Ne dixwim **gêlaz**an ne didim hevrazan.
Ne kortigê **kereng**an bûyin.
Nîsk kirin gîsk.
Nok jî dibêje pozê min heye!.
Pincara çiyayekî bûyin.
Pîrê nemir bihar tê, kero nemir **qîvar** tê.
Qîz **sêva** li darê ye, her kes çoyê xwe davêje.
Sêva çê para hirçê.
Sîr jî ji **pîvaz** re dibêje "wêde here, bîhn ji te tê!".
Tene bûn firîg, mele bûn şirîg.
Tovê **pirpar**ê bûyîn.
Ya tûrek **mêwij**, ya kelemekî tûj.
Zarok **kulîlk**a malan e. (Teşbîh)
Zebeş neçûyîn dêv.

Gotinên pêşîyan:

Dar bi berê xwe şîn e.
Dar û devî bi guh in!
Dara **hirmî**yan **sêv**an nade!
Darê min kulavê min, rehmet li dê û bavê min.
Demek a **kulîlk**an e, demek a **sosin**an e.
Genimê dewsa **kizinê**, berxê li ber bizinê, mêrê bindestê jinê, her sê Hesabê mirinê.
Germ germa **tûy**an e, kêf kêfa rûtan e.
Giya di bin kevir de namîne.
Giyayê hewşê ji xwedî re tahl e.
Gul bê bîhn nabe.
Her **giya** li ser koka xwe şîn tê.
Ji **sorik** patîle çênabe.
Ji **şîlan**ê nîr çênabe.
Ker ji **nefel**ê fahm nake.
Kundirê mîranî, çêtir e ji şekirê şîranî.
Nan nanê **genimî**, bext bextê mêran.
Nanê **gilgil** ji tunebûnê çêtir e.
Nok tê li kokê.
Petêxên zer para kûsiyan e!
Pîr bi **pîvong**ê carek tê xapandin.
Pîvaz pîvaz e, çi sor e çi sipî ye.
Rojek a **gul**ê ye, yek a **gulşîlan**ê ye.
Serîyek **pîvaz**, bîhnê berdide beroşekê.
şohreta çeman **dar û bî**, şohreta qîz û bûkan şar û temezî.
Tebax e, **tirî** bax e.
Temûz e, kakil kete **gûz** e.
Xwedîyê **xiyar**ê çilmisî, ne dixwe ne dide kesî.
Zarê şîrîn, **pîvaz**a tûj dike hinguvîn.
Zebeş bi dengê xwe, **hinar** bi rengê xwe.
Zebeş ji xwarinê re, dendik jî danînê re.
Zor **gizêr**ê radike.

Çavkanî

Baytop, Prof. Dr. Asuman, Bitkilerin Bilimsel adlarındaki Niteleyiciler ve Anlamları, İ.Ü Ecz. Fak. Yayınları, İstanbul, 1995

Baytop, Prof.Dr. Turhan, Türkçe Bitki Adları Sözlüğü, TDK Yay. Ankara, 1997

Bedîrxan, Celadet Alî, Ferhenga Kurmancî-Frensî, Kovara Vate, Stockholm, hûmare: 1-18 (1997-2002)

Davis, P.H., Flora of Turkey and the East Aegean Islands, 10 cîld, Edinburgh (1965-1988)

Erdem, Turan, Ferhenga Zazakî-Tirkî/Tirkî Zazakî, Doz Yay. İstanbul 1997

Farqînî, Zana, Ferhenga Kurdî-Tirkî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Ist., 2004

Farqînî, Zana, Türkçe-Kürtçe Sözlük, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İst., 2000

Gruba Xebatê ya Vateyî/Vate Çalışma Grubu, Türkçe-Kırmancca(Zazaca) Sözlük/Kırmancca(Zazaca)-Türkçe Sözlük, İkinci Basım, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2004

Guest, Evan, Flora of Iraq, Ministry of agriculture Republic of Iraq, 9 cild, Baghdad, 1966

İzolî, D., Ferhenga Kurdî-Tirkî, weşanên Deng, İstanbul, 1992

Malmisanij, Zazaca-Türkçe Sözlük/Ferhengê Dimilkî-Tirkî, Weşanên Deng, İstanbul, 1992

Özcan, Mesut, Zazaca-Türkçe Sözlük, Kaynak Yayınları, İstanbul, 1997

Polat, Edip, Bilim Dilinde Kürtler, Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2004

Qazzaz, Shafiq, Kurdish-English Dictionary, Aras Press and Publishers, Erbil, 2000

Saadalla, Salah, Saladin's English-Kurdish Dictionary, Avesta Basım Yayın, 2000

Tazegül, Emrullah, Tarımsal Bilimler Sözlüğü, cild I-II, İzmir, 1987

Turgut, Harun, Zazaca-Türkçe Sözlük, Tij yayınları, İstanbul, 2001

Vate (kovara kulturî), Stockholm, hûmare, 1-25 (1997-2005)

KURMANCÎ
MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE
Supplément du Bulletin de liaison et d'information
N° C.P. : 65913 A.S.

106, rue La Fayette, 75010 Paris
France, Tel. : 00 33 (0)1 48 24 64 64

www.fikp.org

Directeur de la publication : Reşo ZÎLAN
Réalisation : S. ILITCH & M. HASSAN